Newroz **Hejmar (71)** **Rûpel (2)** **Berçele** **2006z – 2618k**

Serokê Partiya me birêz Ismaîl Umer: "Girtina Şêx Alî nameyeke ji Tevgera Kurdî re

Serokê Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Suriyê (Yekîtî) Ismaîl Umer ("Emo") girtina sekretêrê partiya xwe Mihyedîn Şêx Alî wekî

"nameyeke ji Tevgera Kurdî re" bi nav dike. Umer ji Malpera Amûdê re diyar kir, ku rêjîma Suriyê bi vê girtinê Tevgera Kurdî li Suriyê "tehdîd dike, da karê peydakirina lêvegera kurdî û herweha xebata wê ya di oposîsyona surî de rawestîne". Wî herweha got ku rêjîma Suriyê ji rewşa ku tê de ye "ditirse". Wî berdewam kir û got: "Rêjîm ji xwe ditirse û dixwaze me jî bitirsîne, lê ewê bi ser nekeve." Partiya "Yekîtî" ragihand, ku sekretêrê wê Şêx Alî berî du rojan li Helebê ji aliyê hêzên ewlekariya siyasî ve hatiye girtin. Di hevpeyvînekê de li ser telefonê bi Malpera Amûdê re, siyasetvan Ismaîl Umer diyar kir, ku ta niha ew nizanin bê hevalê wan ê girtî li kû derê dimîne. Wî got ku kesê ku dikeve nav destên hêzên ewlekariyê, "dikeve tariyê". Serokê PYDKS bal kişand ser wê yekê ku girtina Mihyedîn Şêx Alî ne pirseke hizbî ye, "lê ew pirsa tevaya Tevgera Kurdî ye". Wî eşkere kir ku girtina sekretêrê partiya wî dê xebata partiyê qels neke. Ismaîl Umer got: "Hevalên me bi nêt in ku di dema bê de xebata xwe çalaktir bikin." Wî berdewam kir û got ku ger di rojên bê de Şêx Alî serbest neyê berdan, partiya wî dê li Surî û Ewropayê çalakiyên protestoyê li dar xîne. Ismaîl Umer li ser sekretêrê partiya xwe Mihyedîn Şêx Alî got: "Ev 25 sal in ku ew ji aliyê rêjîmê ve tê xweztin, lê wî tucarî daxwaza wan bi cî neaniye û mecbur bûye tim xwe bide alî." Serokê PYDKS diyar kir ku xebata partiya wî bi taybetî li Helebê û herêma wê "rêjîm aciz kiriye".